**Hallo
Basel-Stadt**

Kanton Basel-Stadt

# Pere û bac

Hesab / karûbarên peredanê
Bac
Deyn
Jiyana bi kêmpereyî

# Hesab / karûbarên peredanê

Ji bo bidestxistina pereyan û dayîna fatûreyan pêdivî bi hesabekî bankeyekê yan hesabekî posteyê heye. Ji bo kirînûfirotinê gelek kartên debît an kartên kredît hene.

## Hesab

Li Swîsreyê hema hemû niştecî xwediyê hesabekî ne. Mûçe yan mehaneya kesên kar dikin bi gelemperî di dawî de dişînin ser hesabê wan. Gelek banke û postexane ji bo kesan hesaban pêşkêş dikin. Vekirina hesabekî bi gelemperî belaş e. Lê piştre buhayên cihêreng li ser tên zêdekirin. Buha, faîz û xizmetên pêşkêş dikin li gor her şîrketê cihêreng in û ji ber vê fêdeya dayîna ber hev heye. Ji bo vekirina hesabekî di her rewşê de pêdiviya mirov bi pasaport an nasnameyekê heye.

## Kartên debît / kartên kredît

Kesa/kesê hesabekî bi kar bîne, bi gelmperî ji bo karibe pere bikişîne karteke hesabê xwe distîne. Ev yek tenê li ba banka xwe derbasdar e. Banke yan postexane kartên debît jî pêşkêş dikin (wek mînak, Maestro), mirov dikare bi vê kartê li hemû otomatên bankeyan pere bikişîne û li piraniya dikanan kirînê bike. Ev kart dikarin li derveyî welêt jî werin bikaranîn. Li gor cureyê kartê buhayên cihêreng hene. Mirov dikare kartên kredîtê li ba şîrketên cihêreng bide çêkirin. Xizmetên didin û buhayên wan pir cuda ne, ji bo wê fêdeya dayîna ber hev heye. Danûstendina bi kartên debît an kartên kredîtê niha berfireh dibe.

## Dayîna fatûreyan

Fatûre (Rechnungen) bi gelemperî tevî kaxeza dayînê bi riya postê yan e-mailê tên şandin. Sê riyên dayîna fatûreyê hene:

- E-Banking: Dayîna bi riya internetê pir berfireh û ewle ye.
- Li şaltêrê: Mirov dikare bi kaxeza peredayînê û pereyên bi dest, li postexaneyê fatûreya xwe bide. Kesên hesabê wan ê postê hene, dikarin bihêlin tibaba fatûreyê rasterast ji hesabê wan were kişandin. Muşteriyên bankeyan jî dikarin ji bo dayînên xwe li şaltêrên bankeyan karê dayînê bixwazin.
- Bi riya posteyê: Mirov dikare karê dayîna fatûreyan bi nameyekê ji banke yan ji posteyê bixwaze. Agahiyên pêwîst banke an poste didin mirov.

Derfetên dayîna fatûreyên domdar:

- Dayîna ji ber xwe/dayîna otomatîkî Lastschriftenverfahren (LSV) riyeke hêsan a dayîna fatûreyan a rasterast qutkirina ji hesabê mirov e. Agahiyên li ser vê yekê şîrketên fatûreyan dişînin an banke/poste didin.
- Gava tibaba fatûreya we her meh wek hev be (wek mînak kirêya malê), mirov dikare li ba bankê yan postê erkdarkirineke domdar (Dauerauftrag) a dayîna fatûreyên wiha bide çêkirin.

Li ser fatûreyê her dem demeke dayîna wê tê nivîsîn. Ger di wê dema diyarkirî de neyê dayîn, piştre dikare daxwaza dayîna deyn (Betreibung) were kirin

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/geld-und-steuern/konto--zahlungsverkehr

# Bac

Dayîna bacê li Swîsreyê bi ciyê mirov lê rûdine ve girêdayî ye. Ji bo kesan bacên herî girîng baca hatineyê, baca maldariyê û baca nirxzêdeyî (li gor nirxê wê zêde dibe) ye.

## Sazûmana bacê

Li Swîsreyê konfederasyon, kanton, şaredarî û civakên olî yên fermî bacê (Steuern) distînin. Bacên rasterast û yên nerasterast hene. Bacên rasterast ên herî girîng baca hatineyê û baca maldariyê ye û divê rasterast ji aliyê kesên pêwîstî bacdayînê ne werin dayîn. Di nav bacên nerasterast de baca nirxzêdeyî, baca tûtinê û baca sotemeniyê heye. Ev bac di nav buhayê tiştan de ye. Ji ber ku ji gelek bacan kanton û şaredarî berpirsyar in, di navbera niştgehan de cudatiyên mezin ên di rêjeya baca rasterast de heye. Baca hevjînan bi hev re tê stendin.

## Baca ji çavkaniyê tê stendin

Baca hatineyê ya biyaniyên nû barkirine rasterast ji mehaneya wan tê qutkirin (Baca ji çavkaniyê/ Quellensteuer). Qeydkirina kesên di karekî de bi cî bûne ji aliyê karsaz ve tê kirin.

- Bilindbûna bacê girêdayî hatineyê, rewşa malbatî (azeb, zewicî, hevberdayî) û jimara zarokan e. Divê guhertina rewşê bi lez were ragihandin.
- Ji baca ji çavkaniyê daxistinên cihêreng ên pêvekî mumkun e, wek mînak alîkariyên her 3 stûnan, faîza deynan, mesrefên bilind ên nexweşiyan û hwd.
- Divê kesên maldar agahî û baca maldariyê li halê xwe bidin.
- Ji bo hatineyeke di salê de di ser 120 hezar frankî re, divê ravekirina bacê were dayîn (bacstendina asayî)
- Kî bi hevjîneke, hevjînekî xwediyê pasaporta Swîsrî yan mafê destûra mayîna bêdawî C re zewicî be, divê herwiha formeke ravekirina bacê dagire (bacstendina asayî).

Birêvebiriya Bacê ya Kantonê (Kantonale Steuerverwaltung) agahiyên din ên li ser baca ji çavkaniyê par ve dike. Birêvebiriya Bacê ya Kantonê di pirsên li ser bacdayîna maldariyê de alîkariyê dike.

## Bacstendina asayî

Baca kesên xwediyê pasaporta Swîsreyî yan mafê destûra mayîna bêdawî ya C bidestxistine bi awayê asayî (ordentliche Besteuerung) pêk tê. Bac wê ji mûçe/mehaneya we neyê qutkirin. Divê hûn formeke ravekirina bacê dagirin û baca xwe bi riya fatûreyê bidin. Forma ravekirina bacê dikare bi riya online jî were dagirtin. Dayîneke pêşîn (Vorauszahlung) tê pêşniyarkirin. Çiqasbûna baca tê hêvîkirin dikare li ser hesabkera bacê (Steuerrechner) were hesabkirin.
Dagirtina forma ravekirina bacê ji bo Swîsriyan jî tevlihev e. Gava mirov cara yekê forma ravekirina bacê dadigire, ya baş stendina alîkariyê ye.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/geld-und-steuern/steuern

# Deyn

Gava mirov fatûreyan di demê de nede, ev yek dikare pirsgirêkên cidî bi xwe re bîne. Di hebûna pirsgirêkên fînansî de, ciyên şêwirmendiya deynan alîkariyê pêşkêş dikin.

## Bibîranîn û doza stendina deynan

Ji kesên fatûreya xwe di demê de nedin re, bi gelemperî bibîranîna yekem û ya duyem (Mahnung) tê. Lê belê her dem derfeta kesên bi deyn dane, heye ku doza stendina deynê xwe (Betreibung) bidin destpêkirin. Di rewşeke wisa de fermannameyeke dayîna deynan ji saziya berpirsyariya deynstendinê (Betreibungsamt) digirin. Mesref jî li ser zêde dibin. Kesên xwediyê nêrîna, nemafdarbûna doza deynstendinê ne, dikarin bi pêşniyara hiqûqî (Rechtsvorschlag) li ba saziya stendina deynan li dij dozê derkevin. Baldarî: Doza stendina deynan dikare bibe sedema desteserkirina mûçe/mehane yan jî tiştên bi qiymet. Ji bilî vê doza stendina deynan wê di belgenameya deyndariyê (Betreibungsregister) de were diyarkirin (ger mirov di dawî de deyn dabe jî). Ev yek berî her tiştî dikare di lêgerîna mal û xaniyan de pirsgirêkê derxîne.

## Deyn

Ger xemên we yên fînansî û deynên we hebin, hûn dikarin serî li ciyê şêwirmendiya deynan bidin (Schuldenberatungsstelle). Li wê derê, mirov alîkariyê distîne. Kesên pispor bi kesên şîretan dixwazin re bi hev re li rewşê dinêrin û li çareseriyekê digerin. Rêxistiniya Carîtasê bi riya telefonê şêwirmendiyeke bê nav dide: “SOS-deyn” xeta şêwirmendiyê Telefon 0800 708 708 (belaş). Li gor daxwazê berê mirov didin ciyekî din ê şêwirmendiyê jî. Mirov alîkarî û agahiyên din ên bikêrhatî li ba ciyê şêwirmendiyê yê bi navê Plusminus distîne.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/geld-und-steuern/schulden

# Jiyana bi kêmpereyî

Jiyana li Swîsreyê bi rastî buha ye. Ji ber vê yekê kirîna tiştên bikarhatî dibe ku fêdeyekê bide mirov. Kesên tengezariya diravî dikişînin, dikarin li dikanên taybet bi erzanî bikirin.

## Tiştên bikarhatî

Li swîsreyê gelek dikanên tiştên bikarhatî difiroşin (Brockenhäuser) hene. Li van deran mirov dikare tiştên bikarhatî bi erzanî bikire. Li dikanên taybetî kes jî tiştên bikarhatî difiroşin. Wek mînak sûka kevnefiroşan (Flohmärkte) sûka cilan, sûka berfşematokan û hwd. Malperên internetê jî ji bo kirîn û firotina kevnetiştan pir tên bikaranîn.

## Werziş / çand / perwerde

Mirov bi saya nasnameya Kulturlegi bi dayîna kêmek pere ji bo çalakiyên dema vala, werzişî, çandî û perwerdeyî erzaniyê distîne. Mirov dikare vê nasnameyê li ba Karîtasê bide çêkirin. Karîtas li ser wê agahiyan dide û dinêre bê mafê stendina Kulturlegî heye. Hûnê bi Familienpass, bi FamilienpassPlus an bi colourkey herwiha ji bo gelek çalakiyan erzaniyê bi dest bixin.

## Dikana Karîtasê

Mirovên bi kêmpere dikarin li dikanên Karîtasê (Caritas Markt) li gor hewcedariyên xwe yên rojane û bi buhayekî pir erzan tiştên xwarin û vexwarinê û tiştên din bikirin. Ji bo vê pêdiviya mirov bi karteke taybet a ji Karîtasê were daxwazkirin, heye. Li ser wê Karîtas agahiyan dide û lê dinêre bê mafê we yê stendina kartê heye. Li Baselê dikanek heye.

## Piştgiriya dewletî

Kesên ji bo debara jiyanî pereyên wan kêm in, di gelek rewşan de xwediyê mafê stendina piştgiriya ji dewletê ne. Ew bi vî awayî dikarin wek mînak di dayîna prîma sîgorteya nexweşiyê de erzaniyê bistînin an alîkariya diravî ji bo domandina xwendina xwe bixwazin. Mirov di rewşên diyar ên tengezariyê de pere ji ewlekariya civakî yan jî ji alîkariya civakî distîne. Malbatên bi kêmpere dikarin di bin mercên diyar de alîkariya dayîna kirêya xwe (Familienmietzinsbeiträge) bixwazin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/geld-und-steuern/leben-mit-wenig-geld